

ROJA NÛ

Kiryariya Roja Nû; ji bona erden Sûriye û Libnanê; 10 liyên Sûri; ji bona welatên din 2 liyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc; Weqif Tabet, Telefona Dîwana: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

XWEDÎ Û GERINENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

ZANIN Û PÊŞKETIN

DEWRAN

BOBLATÊN ME ÊN CIVAKI

Milet Çiqas

Bindest dibin, boblatên wan ên civakî jî ewçend pirtir dibin. An boblatên gelekî ên civakî çiqas pirtir dibin, wî gefî ewçend bîndest diêxin. Ji wan her du belayên han kîjan bi ser miletekî da were, a din wekî tava baranê li pê ewran bê atlahî bi ser da digire.

Dema min xwest di bin vê ser nama han da benda xwe binivîsim û min qelem girte dest xwe, serekî dirêj ez şaş û mat mam. Ji ber ko boblatên me ên civakî pir in û yek jî a din mezintir û diwartir e. Di vî warî da, heke em wekî gelên mayî biramin, divê bi baran kitêb bêne nivîsin. Lê heke em weke xwe biramin, dibe ko em karibin ji boblatên xwe ên mezintir hinekan bidine ber çavên xwendevanan. Dîsa divê em ji bîr nekin ko di vî warê han da, piştî ko gelên mayî xwe gihandine bilindçîhên rîya jînê, em gelê kurd jî gemiya Nûh çar bostan bi dîr neketine.

Ji Bextê Xwe

Ê reş; em kurd wekî tovê ko dema reşandinê di bin kevîran da dimîne û jî çîkên baran û tirêjên royê qet destkewîf nabe, her û her tov dimîne, berî hezar salan em çî bûne îro jî hîn ew in. Ev boblatên han, di warê jînê da ko jî bo gelê kurd kêmasîne mezîna in, bi çî awayî dibe ew zane, divê di rîya rakirina wan da em xwe qenc biwestînin. Heya ev boblatên han di jîna me a civakî da hebin, xwe jî vê bîndestîya malkambax xilas kirin jî me ra tu caran lêneyê. Ji bo vê yekê û di vê rê da divê em çavên ywe jî tu zîlan ne parêzin. Divê xatîrê hinan û xeyda hinekan me jî gotîna rastîyê bi şûnda ne de.

Gava Xwedê xwestîye hîmê civata beşerî deyîne, ew jî wekî çendekê wan li ser du lebatan siwar kiriye. Li nik hemî miletan ko jî van her du hîmên han yek jî nû yê din mîr in; li nik me kurdan, hîm yek e û ew jî mîr bi tenê ne. Ji ber, vê yekê jîna me a civakî ne wek miletên mayî li ser du hîman, bi tenê li ser hîmekî hatiye daçîkandin, wekî peyayê bi lingekî. Di warê jînê da bihayê mirovê bi lingekî çîye, di jîna civakî da bihayê me kurdan jî ew e.

Tête gotin ko me kurdan jî jin hene û jinên me jî ên gelên mayî gîstir, xurtir û çelengtir in. Çawan dibe ko jîna me a civakî li ser hîmekî be ? ! ...

Divê Em

Ji bîr nekin ko me kurdan, hîn jinên xwe ne dane wî cihî ko di warê jîna me a civakî da bibin hîmekî ! ... Jîneke ne xwenda û nezan çawan dikare bibe hîmekî jî

AGIR & BOMBE DIBARIN

Pênc Bajarên Elemanî Hatine Bombardîman Kirin

Londre — Ev bîst û çar saet in, refên brîtanî, bê etlahî, li karxane û febrîqeyên elemana û li bajarên ko ew febrîqê di dora wan de kom bûne dixin. Piştî ko refên brîtanî, zora xwe da bûn Frîdrîxshafen, Krefeld û Hulsê, wan nihû Mülheim bombardîman kirine. Kelehên fîrok jî duhî bi awakî gelek xurt Rotterdam û Anvers dane ber bomban. Ejenesa Elemanî jî aliyê xwe dide zanîn ko bombeavêjên brîtanî li Oberhewzenê jî xistine û xesarîne mezîna gihandine hêjagehan.

Londre — R: Şevdî 700 bombeavêjên brîtanî bi ser axa Germanîstanê de girtine û bajarê Krefeldê dane ber derbên xwe.

Londre — R: Wezaretê brîtanî a hewayî dide zanîn: Refên me ên xurt jî bombeavêjan bihevketî, şevdî bajarê elemanî Krefeld bi awakî gelek xurt û bi çêstreke baş bombardîman kiriye. 44 bombeavêjên me venegeriyane qerargehên xwe. Krefeld şarîstaneke mezîna e, rûniştîmanên di wê 170.000 in; di vê şarîstanê de karxaneyên pola û yên kîmyayê ên mezîna hene.

Cezayir — Emîral Mişelye, fermandarê qiwetên frensîzî ên behrî di Elentîkê de jî karê xwe hatiye rakirin û fermandarê Dekarê ber-emîral Kolîne ketiye şûna wî.

Londre — Mr. Averel Harîman, nîmfnendeyê serekcîmhûr Rûzwelt ê xas li Brîtanîyayê jî bona karên ko bi qanûna qerd û kîrêbîke girêdayî ne; piştî ko şeş heftan li Emerîkayê maye, jê vegeyriyayê û hatiye Londrê.

QELANDIN & EDIMANDIN

Ordiya Sor Xwe Kar Kiriye û Pêk Anîye

Moskû — Radyoa Moskovayê duhî evarê çend pîrsên benda rojname rûsî Izvestiya belav dikir, têde hatiye gotin; Şerîna xurt û zor her bi destpêkirinê ne; qerara Ordiya sor ewe; şkenandin, perîşan kirin û qelandîna leşkerên dijîmîna bi tevayî û bi awakî birin. Mîletê sovyetî dikare bibêje ko wî eleman xistiye devê kortalekê. Dersên şerên ko çebûne hatîna mitala kirin û li gora wan tecrîban Ordiya sor jî bona şerên ko di pêşîyê de ne, xwe kar kiriye û pêk anîye.

Cezayir — Di Efrîka bakurî de nihû 120 generalên frensîzî hene; emrê du hebên wan jî şêst salî bêtir e û ên mayîn 56, 54 û 52 salî ne.

Cung-Kîng — Refên amerîkanî yên ko di Yang-Tseyê de arfakariya eskerên çînî dikirin, xesar gihandine cengkeştîyêke japonî.

Londre — Şevdî di Londrê de îşareta talukê hatiye dayîn, lê tu tiştî ne qewimîye.

Berlîn — Radyoa Bêrlînê elam dide; di madenên Bêringê de —axa Belçîke — helaketek çebûye, 50 xebatker hatine kuştin û 15 heb jî hatine brîndar kirin.

Melburn — Japona kirîne dirêjî çeperên eskerên hevalbenda yê Muboyê—erdê Nû-Gîneyê—dîkin, erîşa japonî hatiye şkenandin û xezar gihaye wan.

Londre — Mr. Çorçîl bi hafa kralîca Elîzabet ketiye û pê ve taştê xwariye.

Qahîre — Wezîrê brîtanî ê şerî Sîr Cêmis Grîg, hatiye Qahîrê ew çavê xwe li leşkerên ko di Misrê de ne, wê bigîrine.

hîmên civata beşerîya îro ? ... Piştî ko pêxember jî hezar û sê sed û şeş salî vir da xwendina jîna jî wekî a mîran ferz rave kiriye, kîjan bavê camêr rahiştîye destê keça xwe û birîye dibîstanê. Bê şîk sûçê nezana kurda a vê hedîsê, vedigere ser şêx û melayên ko bi kesî ra nabêjin. Gava yek vê hedîsa han jî derva dibihîse û jî wan dipirse, dibêjin: ew zanîna ko pêxember di hedîsê da qedî kiriye, hîn bûna quranê û rezanên nîmêjê ne. Ji ber ko ew bi xwe jî jî wan tiştan pêva tu tiştî din nîzînan. Gava zanayên me ew camêr bin; hêviya bi ber me xistîna rîya rast nema jî wan dibe.

Ji milê din, dîsa divê em bê fîhêt li xwe nîn ko di nav me kurdan da jî, hîn jî bihayê ker û hespê an ga û çêlekê derbas ne bûye. Ev dewarên han çawan di sîk û bazaran da tîr fîrotin; jî-nên me kurdan jî welê di nav dîwan û odeyên bavên xwe da tîr fîrotin. Bi tenê ferqa di nav bera keç û dewaran da ew e: dewara

frotî bihayê wê tî standîna û keça frotî qelenê wê tî standîna. Heke em jî bavê kîjan keçê ra bêjin: ma gelo tu keça xwe difiroşî ? .. Ko jê bê, bê şîk wê neqenciyeke mezîna bi me bike. Lê dema em bêjîne: filan kes, tu keça xwe bê qelen nadi ? ... Hînga bersiva ko bide me ew e: ma min ew li erdê dîtiye ko bê qelen bidim ! ... Her wekî qelen ne fîrotin lê tiştêkî din e:

Di dinê da şermek jî vê mezintir nabe ko bavêk di nava bîrek mîr da rûne û qelenê keça xwe bazar bike... Gava ew yeka han ne fîrotin bê; êdî nîzam bi çî ra fîrotin tî gotin. Erê, ew rastîyêke welê ye ko qet nayê ve,artin; em kurd keçên xwe difiroşin û fîrotîneke bê rûmet û kirêt... Bi vî awayê han me jînen xwe jî jîna xwe a civakî bê par hîştîne û avahiya wê jîne li ser hîmekî tenê lêkîriye. Ji lewre ye ko heya îro em pêgva ne çûne û bi vî awayî pêşvaçûna me jî ne mikûn e.

Xwedê hez bike ez dê di vî warî da hîn çend bendên din jî binivîsim. OSMAN SEBRÎ

MEZINÊN DINYAYÊ




SEREKCIHÛR MR. RUZWELT

BO XOŞEWÎSTÎ ME

Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Le bo gewrê û xoşewîst man Norî çaw û sebrî dil man Kamiranî Bedir-Xanî Her bîji şerî jîyan-man Be omîdî qebûl-kirdin Reşbelêkî dilî reş-man Binêre bom Roja-Nû zû Dîyar e, nav û nîşan-man Be roj digrîn û denalênin Be şew xew heram e lê man Çaw le Hawar degerînin Nîzanîn boç nayê bo man Gelawejîş gulweşîn e Gulêke le baxî xoman Ronahî dînyay ronak kird Şewqî da deşt û çîya-man Roja-Nû derket le latan Roja kon derçû le laman Hewrî reş û tal bilaw hû Be derkewt norî îman-man Roja-Nû hat bira kake Dekatîn şekway ehwal-man.

KAKE EMÎN HIWÊZÎ



Eskerên Hevalbenda wîlo pê li Erdê Efrîqa Bakurî dikirin

Hezar Waporên Barkêş

Washington — Destgehên amerîkanî hero 5 angon her meh 150 wapora çêdikin; di nav donz de mehên dawîn de, yên ko li 31-ê gulanzê dihayê destgehên emerîkanî 1000 wapor çêkirine û 100 waporên banzîne jî, ji tîpên mezintir

DEMA NIHA

VEGERA KRAL CORC VI

Kralé Inqilistané Ji Efrîqayé Veşeriyaye Londré

Londre — R: Kralé Inqilistané, xwedî tac û kişwer Corc VI ji Erdé Efrîqa Bakurî û Maltayé veşeriyaye û hatiye Londré. Serekwezîr Mr. Corçil di balafirgeha payetextê de, li hêviya wî bû. Îro serê sibehê wezîrên britanî bi lewayî çûne Seraya Buckinghamê; xwatirxwaziya kralê xwe.

Vi, 1 — A.F.I. Mihendizekî frensîz isûleke nû peyda kiriye û ji qalûşên kertol û fesûliyan kaxez çekiriye.

Nû-York — R: 125.000 xebatkerên madena berên komirî, yê nêşê xwe berda bûn, hêj dest bi xebatê ne kirine.

Berlîn — R: Eleman di şînemayan de bi filmêkê, xesarên ku bombardimanên Hevalbenda gîhandine şaristanên elemanî pê xelkê xwe dikin.

GENERAL DE GOL

Hatiye Xatirxwaziya Erd û Bajarê Tûnisê

Cezayir — R: Radyoa Cezayirê dîde zanîn: duhî General De Gol hatiye Tûnisê û çûye xatirxwaziya Begê Tûnisê û ya pêdarê vî erdê General Mast.

Lizbon R:— M. Puc, Pêdarê Fasê e giyanî, ji Hikûmeta Portîxalê re da zanîn ko tu waporê barkêş nikare bê destûra hikûmetê di behrên pêravên Efrîqa Bakurî de geşt û guzar bike; û waporên ko bi ya vî emrî ne kirîne, dê bêne xerîqandin.

Wesington — A.F.I. Xanima Mareşal Cang-Key-Çek, serdarê Çînî, der wan rojan, dê bê payetextê Emerîkayê û di Qesra Spî de, wê bibe meyvana Xanima Serekîcmîhûr Rûzvelt.

Rio De Janeiro — A.F.I. Balafirêke brêzîlî di Behra Rioyê a dûr de noqaveke elemanî bin av kiriyê.

Strana Kurdi

DE GIDYANO!

De Gidyano! De Gidyano!
Bîra gundê me xetîmî
Keçîkê digot: sing û berê min
Mîna qeymaxê miya,
Nivîşkê serê sibehê,
Min ji delalê xwe re danî
Ser nankî genimî.....
Min sund xwariye bi Qurane
Ez tu car narim
Wî hundirî, wî kavill
Wî mîratî, wî sitimî.....
Min dî ji nivê şevê pê ve
Delalê dilê min
Di nav çihê min de diqedimî. Migo:
Bila Xwedê ji melayê gundê me
Nexweş be.
Çava mehra min bîrî
Li wî kotikî, li wî çepelî
Li wî ma'dzerhemî.

De Gidyano! De Gidyano!
Bîra gundê me bê qam e
Jêr de kanî ye, jor de cam e
Ez û delalê dilê xwe
Bist û çar saeta tê de mane;
Min nizanî bû
Ko dilketina min û bejna zirav
Sala vê salê bi milam e.

De Gidyano! De Gidyano!
Delalê dilê min dike
Di xopanê gundê me de
Avanîkê çêke
Ezê bigînim Midyata xopan
Dû Şam û Şekiro
Bila bèn, çikî ji min û bejna zirav
Li tebeqa jorî çêke
Kul û kederê bejna zirav
Di ser dilê min de şax berdane
Bûne kotik û merez
Û xem û xiyal û girêk e,
Şixula min û bejna zirav
Li erdana xira bûye;
Belkî Rebê alemê
Li ezmana ji ba xwe çêke.

De Gidyano! De Gidyano!
Roka me li nav beyna
Nfro û esir dageriya
Xwezîla ji xeyra Xwedê ra

Ezê ji kevoka bibûma
Kevokê xubariya
Şevkê minê ji nivê şevê pê ve
Xwe berda hebza Mêrdinê
Nav girtiya û nav hebziya
Digo: delalê dilê te rakirin
Dane ber qundaxê eyneliya.

De Gidyano! De Gidyano!
Bi ser min û delalê min de
Hat payîzê wextê tirî,
Min dî şevkê ji nivê şevê û pê ve
Dê û bavê min
Li hewşa me sêkinîn, pev şewirin
Keçîkê gazî dikirê digo:
Lo, lo lawiko

Mala bavê te şewitiyo!!.....
Rojkê were bi qewil
Û resûlê Xwedê
Min ji mala bavê min bixwazê.....
Sed wa'de, li canê min keti be
Ko ez ne dam te
Ezê rabim bi dawa taqî bigirim
Li bav û bira herim gili
Qatî ne bû

Miradê min û bejna zirav;
Ezê serê sibehê rabim
Destê xwe di kêlekê xwe yî
Vala xînim.....
Ezê li ser rêka welatê xerîb û
xurbetê
Bi dû bejna zirav de dikewkirim
Qatî ne bû
Miradê min û bejna zirav
Ezê herim di mala xelkê dolal de
Rûnim ne mehirkirî.


De Gidyano! De Gidyano!
Navbeyna min û bejna zirav
bi diwar e
Alî kils e, yek nikar e
Cotê memkê min xanim xatûnê
Yek sêv û yek pirtîqal e.....
Keçîkê gazî dikirê digo:
Lo..... lo! Lawiko
Şevkê ji nivbenda şeva û pê ve
Were tewafa singê berê min keçîkê
Ji te re xwestir e
Ji teberika mala Şexê Kal e.
Ji girêdana piştê ber jor de
Tu çî dixwazî ez minêkar im
Ji girêdana piştê û ber jêr da
Ez mîrîda mala Şexê Kal im
Çî bixwazî ez ni karim.

MIREKA CIHANE

MIRÊKA CIHANÊ MIRÊKA WENÊYÊN SER Û AŞTIYÊ

CIHAN & EMERIKA

Îsal karxaneyên emerîkanî 99.000 balafira çêdikin.
Meha borî wan 7.200 balafir çekirine.




KELEHEKE FIROK - BOMBEAVÊJEKE EMERİKANI



Emerika bê etlahî bi her texlît çek û posatên şerî arîkariya Ewîstralyayê dike.

JIN Û KEÇ JI TÊNGAZIYA EWİSTRALIYAYÊ



2.500 Eşkerên emerîkanî, ji xwîna japonê di giravên Hewayiyê de hîfşkerîne di bin.

ESKERÊN EMERİKANI JI XWÎNA JAPONÎ



Desîgahên Emerîkanî bi şev û bi ro bi çekirîna cengkeştîyan mijûl in.
Zîrehpûşeke emerîkanî bi şêş topên xwe bi hev re gemiyên dijîna dîde ber derbên xwe.

ZIREHPÛŞEKE EMERİKANI, 41.000 TON MEZIN.

LE JOUR NOUVEAU

Direction : Beyrouth Wekfs Tabet
Place des Canons Tél.: 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 10 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 10 L.L.S. Etranger 2 L. Sigs.

Vers la Victoire

CHRONIQUE HEBDOMADAIRE
DE LA GUERRE

L'évacuation spontanée de Castel Rosso, petite île qui était occupée par les Italiens à quelques kilomètres de la côte méridionale de la Turquie, est une des premières manifestations de la stratégie offensive des Alliés en Méditerranée orientale. Impossible à défendre, cette île n'aurait sans doute pas un grand intérêt militaire. Notons en passant, que son évacuation (à moins qu'elle ne soit une feinte) peut signifier que le Proche-Orient n'est plus un objectif immédiat de l'ennemi. Cette évacuation confirme, s'il en était besoin, ce que l'on savait-déjà des craintes qu'ont ces Messieurs de l'Etat-Major d'en face d'une attaque alliée sur les positions qu'ils contrôlent en Mer Egée. Et le bombardement du plus important aérodrome utilisé en Grèce par les Allemands, au Sud de Salonique, vient surabondamment justifier ces craintes.

Mais cela n'est rien auprès de la grande peur qui paralyse maintenant l'Italie. Objet d'une offensive aérienne qui dépasse l'imagination d'un Hitler et a fortiori celle d'un Mussolini, elle voudrait crier grâce. Non seulement ses ports, ses aérodromes, ses moyens de communication, ses industries de guerre connaissent la destruction systématique, et sa population est épouvantée par l'effet des bombes quotidiennes d'une, deux et même quatre tonnes, mais encore le peuple italien et ce qui reste de ses dirigeants fascistes (qui il y a trois ans, voyaient s'ouvrir la perspective d'une guerre facile) attendent aujourd'hui l'invasion avec la certitude mortelle que la résistance ne sera pas longtemps possible.

Pourtant le comble à leur affolement, l'Allemagne laisse ouvertement paraître son mépris à l'égard de ces Alliés mineurs qui n'ont jamais pu lui apporter d'aide efficace dans les moments décisifs: l'Albanie, dernier fragment de l'Empire Italien, est maintenant et entièrement sous le contrôle nazi. Von Bock chargé de défendre la péninsule italienne, avec l'appoint de nombreuses divisions allemandes, naturellement, a exigé que le commandement total lui fut donné; dans un dernier sursaut d'orgueil, l'Etat Major Italien aurait refusé.

Il paraît cependant invraisemblable qu'Hitler confie aux seuls Italiens le soin de défendre leur pays. Ce serait ouvrir trop facilement la porte du Continent européen; les coups terrifiants portés à la Spezzia, à Naples, à la Sicile, à la Sardaigne, à la marine (13 bateaux coulés et 7 endommagés en l'espace d'une semaine) sont en train de miner définitivement le désir, qui n'est pas volonté, de faire leur ce nouveau slogan nazi plein de signification: «tenir bon.»

D.

PAROLES EN L'AIR

«Si Goebbels n'existait pas, il faudrait l'inventer», serait-on tenté de dire devant les efforts désespérés du petit Docteur, appelé à intervenir chaque fois que cela va mal. Il accourt, il déverse l'huile de son éloquence sur les flots déchainés, et les flots se calment — pour un temps, du moins.

Hitler en personne s'écrie orgueilleusement, le 15 Septembre 1942: «Stalingrad tombera, vous pouvez en être certains». Mais c'est Goebbels qui doit annoncer, au Sportpalast, que la 6ème armée de von Paulus est anéantie. Le Führer, lui ne peut s'absenter du théâtre des opérations, où il tente d'enrayer la déroute de ses troupes.

C'est Hitler, Commandant en Chef des Forces Armées du Reich, qui donne l'ordre de bombarder successivement Varsovie, Rotterdam et Coventry. Mais c'est Goebbels qui l'on envoie à Wuppertal, pour porter les condoléances du Gouvernement aux populations durement éprouvées de l'Allemagne Occidentale. Et cette fois-ci, Hitler n'a même pas l'excuse d'opérations d'envergure qui le retiendraient sur le front oriental. Le communiqué allemand annonce des combats d'importance locale. Mais le Führer n'ose paraître en personne devant les familles éplorées: il se contente de demander par téléphone des nouvelles sur l'état des villes bombardées.

Hoffmann, Gauleiter de la Ruhr, déclare en effet: «Le Führer ne cesse de penser à vous. Après chaque raid, il téléphone pour avoir des nouvelles. Cela prouve qu'il pense à vous, à chacun de vous». Retournant le vieux proverbe «Loin des yeux, loin du cœur», Hitler semble trouver dans la distance qui le sépare des manifestations de son peuple, une inspiration de tendre sollicitude. Et c'est Goebbels qui se rend sur place, pour parler au nom du Führer.

Ce pauvre Goebbels semble fatigué. Lui-même le laisse d'ailleurs entendre, car il s'écrie, dans son dernier article dans la revue hebdomadaire intitulée «REICH»: «Quel est le pays belligérant dans lequel le Ministre de la Propagande

rendrait compte à son peuple, semaine après semaine?» Plaignons l'Excellence qui ajoute à toutes ses charges celle de l'article hebdomadaire du «REICH». Mais répétons, une fois de plus: «Si Goebbels n'existait pas, il faudrait l'inventer.» Car que l'on explique cela par son état d'épuisement ou par un découragement subit, le petit Docteur laisse échapper des lambeaux de vérité qui nous permettent de reconstituer petit à petit, l'image du Reich à l'heure actuelle.

Bien sûr, Goebbels promet aux ouvriers des régions bombardées, de formidables représailles de la Luftwaffe. Mais n'a-t-il pas promis aux Allemands une formidable offensive en Russie, pour les consoler de la débâcle de Stalingrad? Quatre mois ont passé, et l'offensive est toujours à l'état de projet. Craignant que ses promesses ne fassent long feu, Goebbels se lance donc dans une longue apostrophe du silence: «Le silence est d'or» s'écrie sans rire ce bavard qui accouche d'un article par semaine. «Nous avons des projets formidables, mais chut; pas un mot, les oreilles ennemies nous écoutent.» Croit-il vraiment rassurer par ce moyen puéril ceux qui reçoivent toutes les nuits la visite des bombardiers alliés?

Il le croit si peu qu'il poursuit «Il y a trop de gens chez nous qui reprochent au gouvernement du Reich de s'être trompé dans ses prévisions. Un gouvernement n'est pas plus infallible que n'importe quel être humain. La preuve, c'est que le gouvernement britannique a commis d'innombrables erreurs. Mais nos super-objectivistes parlent tout aux gouvernements étrangers, et ne sont sévères que pour le leur.»

Allons, Docteur, une cure de repos s'impose. Comment vous avouez qu'après dix années d'éducation national-socialiste (que vous avez vous-même dirigée au moyen de votre Ministère) et après trois ans et demi de «guerre purificatrice», de trop nombreux Allemands préfèrent le gouvernement démocratique de Grande-Bretagne au vôtre?

Décidément, Docteur, le silence est d'or.
LUCIE VIDAL

POÈME KURDE

PARLE-MOI

Parle-moi comme parle le mystère
Dans l'immense jardin du monde,
Comme la brume sur les bruyères,
La mer par ses ondes,
La forêt dans le vent,
Dans son rêve le savant,
Dans le rire la fête,
Par son amour le poète,
La cascade sur les rochers,
Par ses rides le débauché,
Comme la fleur par son parfum,
Par sa mémoire le défunt,
Les nuages dans le ciel,
L'abeille par son miel.
Parle-moi
Toi
Qui connaît l'art de parler
Dans le vide de ton absence.
La cadence
De ta voix charmeuse a rempli
Mon âme
Ni cri, ni blâme
Les semaines passent et les années.
Tu es muette
Comme un temple suranné.

DR. BEDIR KHAN

Les Dépêches de la Nuit

Front de Méditerranée

Les «Porteresses Volantes» américaines étaient à peine rentrées à leur base après leur raid sur Messine et les incendies brûlaient encore que des formations de bombardiers de la R.A.F. venaient parachever leur œuvre. — Guidés dans la nuit par la leur des incendies, les bombardiers britanniques ont déversé des tonnes d'explosifs sur la gare maritime et les installations du ferry, sur la gare centrale et sur les dépôts de carburant. Tous les appareils de la R.A.F. sont rentrés indemnes à leur base.

Front aérien d'Europe

Des «Beaufighters» du Commandement côtier ont attaqué un convoi allemand au large des côtes de Hollande. 3 navires d'escorte et l'un des cargos ont été atteints par des bombes. 2 avions ennemis ont été abattus au cours de cette opération. 3 autres appareils allemands ont été descendus au-dessus de la France et 1 au large des côtes sud-est de l'Angleterre. Un seul avion britannique est porté manquant.

Cinq cents ans s'écoulerent encore, et je voulais revoir l'île. Le palais était délabré, son maître était à peine plus grand qu'un homme d'aujourd'hui. Il ne me salua pas, et me jeta en pâture une chèvre crevée. Je partis, sans avoir calmé ma faim.

Sire, je ne veux pas vous importuner par un trop long récit. Au bout de cinq cents nouvelles années, j'entrepris de franchir l'océan. Fatigué par le voyage, je m'arrêtai sur l'île, pour prendre haleine. Majesté, le beau palais de jadis n'était plus qu'une ruine. J'aperçus, caché derrière un pan de mur, un homme sale, déguenillé, tout pareil à ceux d'aujourd'hui. Il avait un arc à la main; j'évitai de justesse le trait qu'il me décocha, m'enfuyant à tire d'ailes.

Et voilà, Sire ce que j'ai vu ici-bas.

Le roi Salomon, s'étant grandement émerveillé de ce récit, remercia le vautour et le fit richement récompenser.
R. LESCOFF

CONTE KURDE

Le roi Salomon régnait sur les génies, les hommes et les bêtes. Un jour, il ressembla les oiseaux, et leur demanda:

— Oiseaux, quel est le plus vieux d'entre vous?

— C'est, répondirent les oiseaux, le vautour.

— Approche vautour, dit le roi Salomon. Depuis combien d'années es-tu au monde?

— Sire, depuis mille ans.

— Et qu'as-tu vu de remarquable, ici-bas?

— O Roi, j'ai vu un de mes pareils qui a trois mille ans.

— Va le chercher, ordonna Salomon.

Le vautour s'envola. Une heure plus tard, il revenait, suivi d'un vieil oiseau les ailes déplumées, le cou ridé, le bec émousé, les serres usées, le chef branlant. Tous deux saluèrent et prirent place. Le Prince s'enquit:

— Est-il vrai que tu aies trois mille ans?

— C'est exact, Sire.

— Dis-moi qu'as-tu vu ici-bas, au cours de ta vie?

L'animal hocha la tête et répondit:

— O Roi, j'ai connu des mo-

ments agréables, j'en ai connu de pénibles, mais je n'ai jamais eu qu'une aventure qui mérite d'être contée. Un jour, j'étais jeune, a-lors, j'étais vigoureux—, je pris mon vol, et je montai dans le ciel très haut, jusqu'à toucher le soleil, dont les rayons me brûlaient, si haut que la terre m'apparaissait minuscule et lisse comme un œuf. Alors, je redescendis. Le monde grossissait peu à peu; les mers, les montagnes redevinrent distinctes, et j'aperçus un immense océan, au milieu duquel il y avait quelque chose de blanc. Je piquai sur cette tache. C'était un îlot, qui portait un palais somptueux et brillant. Je me posai sur un roc, en face du porche du bâtiment. Un homme sortit; et sa taille était, Sire, égale à celle de trois hommes d'aujourd'hui. Il me souhaita la bienvenue, rentra, et revint bientôt, portant sur ses épaules un chameau fraîchement égorgé, qu'il posa devant moi, je me rassasiai, et, m'étant reposé je pris congé et regagnai mon pays.

Cinq cents ans plus tard, j'eus l'idée de retourner à l'île. Le palais avait perdu sa splendeur, l'homme qui en sortit était moins grand, moins bien vêtu. Il ne me donna qu'un morceau à manger.

DI WELATÊ ZEMBEQÊ GEWIR DE

Nivisevan
Grigori Petrof

Wergerlandok :
Qedrt Can

6

Piştî ser-destiya Üris; gelek ji xelkê İsweçê -- li Finlandayî -- mayîna xwe, xwestin. Lê ne mîna berê bi hakîmanî û efendîî... Vî-xelkî jî ji bona pêşveçûn û bilindbûna welatê xwe ê nuh, jî dil, dest bi xebatê kirin. Berê, yên di vê rê de dixebitîn, hindik bûn... Wê gavê Xwenda, Mamosta û Rahîbên Finlanda, ewqas hindik bûn ku bi tiliyan dihatin jimartin. Lê vî halî, quweta munewerana a manewî ne dişkand... bêtir û zêdetir dikir.

SENELMAN

Hêj di saxiya Çar Aleksandîrê Yekemîn de, merivek bi navê (Senelman) serokê civata çand «Kultur» a Finlanda bû. Ji ber vê yekê, em hebeke behsa dîroka jiyîn û xebata wî bikin:

(Yohan Vilhelm Senelman), di 12ê gulane, sala (1806) de, li Stokholm, hatiye dinê... û di çarê Temûza sala (1881) de li «Dancarbî» miriye.

Ev Camêr, alimekî mezin, feylesofekî kûr, siyasîkî dengîn bû... Lê hêj bêtir, di pêşvebirina çanda qewmî û mamostefiya ku ji yelkê re kiriye, bi nav û deng e.

Senelman u hevalên wî, bere bere, bi xebatên xwe, welatê xweyî bi hezar û yek çiravî kirin **WELATÊ ZEMBEQÊN SPL...** Ev lawê Finlandî, hetanî sax bû, xwestiye vê rastiya hanê, bexe serê welatîyên xwe: Finlanda: her gav di bin tehlûka îstîlata Üris û İsweçan de... Ji bona li berxwedayin (mu-

qawimet) a van dijmînên mezin û xurt divê em bi çand «hirs» a xwe jî wan bilindtir bin...

Senelman, rojnameyek bi navê «Sayma» derdixist. Di wê rojnamê de, tim jî welatîyên xwe re ev gotin dikir: «Kînga mîletê me yî biçûk, jî mîletên cîranê xwe yên mezin bi medeniyet pêşdetiî bibê, hingî tehlûke na mîne...


Finan, bi salan ve, jî bora pêşveçûn û bilindbûna çanda mîletê xwe xebitîne... û fro, jî gelek mîletên Ewrûpî bêtir xwediyê medeniyetê bû ne. Edî, li kêleka cîranê xwe yên biçûk û mezin xwediyê, huquqî, serbestî û serxwebûnê bûne û tu tîrsa wan jî tiştêkî ne maye.

Senelman, di nav minewerên Finlanda yên nuh de fîmsalek e: vî Camêrî çend mamosta, papas, û ebûqatan, jî bona belavkirina mezarîfê, mîna xaçparêzan (ehlê selib) seferber îlan kiribûn. Wî û hevalên wî ditgot in:

«Minewerî, ne ku kinc û serpoşên modayê li xwe kirine... Koma mineweran, mîna heşê mîlet e. Mîlet, hûn ne dane xwendin ku hûn piştî xwendineke qenc, herin li çayxane û meyxaneyan rûniya, li ser masan isqambîl û domîno bilîzin... Yên wîsan dikin minewerê zingarî ne... Yên xwenda, deydare înkîşafa heşê mîlî, deydare hiqyarkirina wîcdanê welatî, deydare xurtkirina vîn (trade) a qewmî ne...

PÊJINÊN DINYAYÊ

Çîredestiyên Zanin û Himetê



BALAFIRÊN MEZIN YÊN BAR Û ESKERKÊŞ

Di wan balafrên de du sed esker bi çek û posatên xwe ve bi cih oibin. Ev mekîneyên he, jî balafran bêtir nîzingî trênan û waporan e.



WAPOREKE BALAFIRHILGIR JI TÎPÊ MEZIN

Keleheke mezin ya ko warê 80 û heta 100 balafrên şerî ye. Îro stoleke mezin bê tevkariya balafrîhîlgîra dirêjî erd û stolên meyara na ke.



ZIREHPÛŞ, ŞERÊ BEHRÊ, KELEHÊN MELEVAN

Zirehpûş, wapora şerî a mezintir e; ew 35 û heta 41 hezar ton giran in, gullejên topên wan ên mezin li armcên ko 20,000 mêtir dur in dikevin. Mîrtîya Behrên Cihanê di destê wan de ye.

GUL, BIHIN, JINÊN SPEHÎ



DELALÊN DILÊ XELKÊ

DÛRIK

DÛRIKÊN LI BER TEMBÛRÊ KOTIKO

Mala te bi kotiko
Çim xwehro, çim qeysiko
Lawê Hora dihniko
Hema xwe pizik diko
Teres siwarê deşiko
Nav beyna Mercê û Metîna
Ji xwe re kiriye qevziko
Kotik derket ser bana
Ban kir melekê ezmana
Rûhê kotik bistînin
Bavên axê cebana
Mala te bi kotiko
Çim xwehr û çim qeysiko
Tu wek jîna b' du giyana
Li gasîna tif diko
Ne kurk û ne çêçiko
Ne mîh û ne berxiko
Ne bizin û ne kehriko
Ne çêlek û goliko
Lawê Hora dihniko
Hema xwe repik diko

XIDIR

Hey Xidir, Xidir, Xidir
Li ser minara ban dikir
Her jî du riwa tim li vir.

Xidir hilos bilos
Teres lawê kerfirroş
Xidir te û dilezîne
Ba li bîrîkê dixîne
Ji Xelkê weyê mîcîdî ne
Hemî rişk û sipî ne
Xidir çu ye Mêrdînê
Xwe jî eşq û dila dihejîne
Xidir çu sîka kera
Nan kirî bû b' deh pera
Li Mêrdînê, kir xela
Çavê teres li teşxela
Hey gidî, gidî lo Xidir
Her jî du riwa tim li vir.

ÊMO

Hey Êmo, Êmo, Êmo
Tu here w' ez bibêmo
Êmo li bînya tehtika
Ramûsana keçika
Xweş jî mastê elbika.
Memkê xwe li devê mi ke
Xwedê te bi rîzîqê mi ke
Êmo keçika keşe ye
Paşîl tijê xurme ye.
Êmo li bînya xaniya
Memkê Êmo mi diya
Xweş e jî gogtê kêviya
Hey Êmo, Êmo, Êmo.
Êmit, Êmo, Êmûşê
Dev tu ne, rûn difiroşê
Mêr tu ne kur li koşê
Koçera deşta Mûşê.
Êmo d'hat û d'gulgulî
Eynik danî, û xemilî
L' bejnê paçîkê gulî
Xeftan l' bejnê edilî
B' gêx û mela l' ya min î
Mehbûba l' ber vî dîlî.
Êmo, Êmo, Êmûşê
Êmo dî li banê banî
Tu b' xîzêmek ridwanî
A ko mi digo te anî
Sed bîmbarek li wî canî

Ramûsan

Mî dî bû, te dî bû
Nav pembûta
Wêz ramîsim
Her du rûa
Mî dî bû, te dî bû
Nav tûtîne
Pîling deyne
Ser qelyûne
Te ramîsim
Te xatîne
Mî dî bû te dî bû
Nav geneka
Wêz ramîsim
Bi heneka,